


# JI BO DERSÊN ZIMANÊ KURDÎ PIRTÛKEK NÛ HAT ÇAPKIRIN!



**Yekîtiya Mamosteyên Kurd li Ewrûpa-YMK** ji bona dersên zimanê dayikê yê kurdî, zaravayê kurmançî pirtûkek nû amade û çap kir. Ev pirtûk ji bo zarokên kurd ên ku li dibistanên Almanyayê bi fermî diçin dersên zimanê kurdî, pola yekemîn hatiye amadekirin.

Armanca pirtûka **Kurdî 1 (kurmançî)**, bi hînkirina alfabeya kurdî ya latînî re, hînkirina; axavtin, xwendin û nivîsandina peyvên bingehîn e. Di heman demê de bi van peyvên tên hînkirin re hevokên hêsan ên axavtina rojane li gorî asta dibistanên serate jî tên avakirin.

Pirtûk bi çavdêriya **Komisyona Materyalên Perwerdeyê** ya **YMKê**, ji aliyên, pedagojîk, metodîk û dîdaktîkî ve hatiye nirxandin û wek pirtûka dersa zimanê kurdî hatiye pejirandin. Pirtûk bi alîkariya **Fedrazyona Zimanê Kurdî ya Navdewletî** hatiye çapkirin.

## Pirtûk ji sê beşên sereke pêk tê

1. Xwendin û nivîsandina tîpan û bilêvkirina peyvên bi heman tîpan
2. Xwendin û nivîsandina tîp û peyvên û kîtekirina heman peyvên
3. Xwendin û nivîsandina peyvên û hevokên hêsan ên bi van peyvên

## Kurdî (Kurmançî) 1 / Kurdisch 1

**Nivîskar:** Abdulkadir Ulumaskan, Mahmut Aydın

**Edîtor:** Abdulkadir Ulumaskan

**Weşanxane:** Weşanên Yekîtiya Mamosteyên Kurd

**Cih û dema çapê:** Çapa yekem, Almanyayê, Cotmeh, 2024

**Pîvanên pirtûkê:** A4 (21 X 29,7 cm), 154 rûpel

**ISBN:** 978-3-939844-82-2

**Bihayê pirtûkê:** 13 €

**Xwestina pirtûkê:** [bestellservice@denge-mamoste.com](mailto:bestellservice@denge-mamoste.com)